



Makale Geliş Tarihi: 16.04.2018

Makale Kabul Tarihi: 05.08.2018

## DENGBÊJIYÊ DE LI DOR TEMAYA ŞER Û KUŞTINÊ NIRXANDINA KILAMÊN ŞÎNÊ

65

Cihan KAYNAR\*

### KURTE

Çanda dengbêjiyê ji berê heta niha hestên civaka Kurdan îfade kiriye. Yek ji van hestên ku em di kilamên dengbêjan de rast tî hesta xemgîniyê ango şînê ye. Peyva şînê, di çanda Kurdan de ji bo qewimînên xembar û dramatik tê gotin.

Şîndanîn/şîngirtin/şîngirêdan di nav Kurdan de wek ritûel xwediyê hinek taybetmendiyên e. Lê, vekolîna van taybetyan li derveyê sînorê vê xebatê ye. Şîn, herçend bi qewimînên kuştin û mirinê re têkildar be jî em dibînin ku di kilamên dengbêjan yê evîni, şer û lehengî de jî hestên xembarî û şînê dertên beriya me. Li kêleka van em dibînin ku li ser bûyerên xwezayî yê wek erdhejê ku di bîra civakê de mane jî kilam hatine gotin.

Dengbêj bi saya zimanê hestiyar û şeweya xwe, bûyerên xembar estetîze dike û pêşkeşî bîra civakê dike. Di vê xebatê de armanca me ew e ku em di kilamên dengbêjiyê yê ku behsa şer û kuştinê dikin de li taybetiyên temaya şînê bigerin. Herwiha di vê xebatê de em dixwazin di kilamê şer û kuştinê de hêmanên hevpar peyda bikin. Di vê xebatê de em ê lêbikolin gelo di kilamên şînê de dengbêj ji aliyê vegotinê ve rêbazekî çawa diceribînin û di honaka kilameke xemgîniyê de kîjan hêmanan diemilînin. Ji bo vê xebatê me şeş kilam bijartin ku mijara wan ya ewil şer û kuştin e. Kilamên ku me deşîfre kirine ev in: Şahîno, Qasimo, Silêmanê Emer, Bavê Koroxlî, Hesenê Mala Mûsa û kilamek Huseyno ku li ser kuştina leşkerekî Gimgimê hatiye gotin.

**Peyvên Sereke:** Dengbêji, Kilam, Şer, Kuştin, Şîn.

\* Xwendekarê lîsansa bilind ya Zanîngeha Mûş Alparslanê ya Beşa Ziman û Çanda Kurdi.  
cihankaynar7@gmail.com

## ÖZ

### *Dengbêjlikte Savaş ve Öldürme Temaları Çerçevesinde Yas Şarkılarının Değerlendirilmesi*

Dengbêj kültürü tarihten günümüze kadar Kürt toplumunun duygularını ifade etmiştir. Dengbêj şarkılarında karşımıza çıkan duygulardan biri de gam, yani yas duygusudur. Yas sözcüğü Kürtçe’de gamlı ve dramatik olayları dile getirmek için kullanılır.

Yas tutmak/bağlamak Kürtler arasında bir ritüel gibi bazı kendine has özelliklere sahiptir. Fakat bu özelliklerin araştırılması bu çalışmamızın sınırlarını aşar. Yas her ne kadar öldürmek ve ölüm olayları ile bağlantılı ise de, dengbêjlerin aşk, savaş ve kahramanlık şarkılarında da gam ve yas duyguları karşımıza çıkar. Bunun yanında deprem gibi toplumun hafızasında yer tutan doğal olaylar için de şarkılar söylenmektedir.

Dengbêjler duygu dolu dilleri ve yöntemleri ile gamlı olayları estetize ederek toplumun hafızasına sunar. Bu çalışmamızın amacı savaş ve ölüm konularını anlatan dengbêj şarkılarında yas temasının özelliklerini aramaktır. Ayrıca yas ve gam şarkılarında ortak unsurları bulmaya çalışacağız. Yine yas şarkılarında dengbêjlerin takip ettikleri yöntemleri ve bir gam şarkısını kurgularken kullandıkları imajların ne olduklarını bulmaya çalışacağız. Bu çalışmamız için ana konusu savaş ve ölüm olan altı şarkı seçtik. Deşifre ettiğimiz şarkılar bunlardır: Şahîno, Qasimo, Silêmanê Emer, Bavê Koroxî, Hesenê Mala Mûsa , ve Huseyno’nun Varto’lu bir askerinin öldürülmesi üzerine söylediği bir şarkı.

**Anahtar Kelimeler:** Dengbêlik, Şarkı, Savaş, Öldürme, Yas.

## ABSTRACT

### *An Evaluation of Mourning Songs in Regards to The Themes of War and Murder in Dengbêji*

The tradition of dengbeji (dengbêji) has been verbalizing different aspects of Kurdish society since time immemorial. One of the themes that we have encountered in the songs of dengbejs is mourning. The word mourning itself expresses harrowing and dramatic stories back in the day.

Mourning as a ritual has some characteristics among the Kurds. The task of investigating these features lies outside the scope of this article. Despite the fact that mourning is associated with killing and death, we can still observe feelings of grief and mourning in the songs of dengbejs which are coupled with love, battle and heroic saga. Besides these, observably there are some other dengbej songs about earthquakes that are embedded in public memory. The dengbej, by the way of his emotional language and special verbalizing method of it, aestheticizes mournful sob stories and presents them to the collective memory.

This article aims to investigate the notion of mourning in the dengbej songs with regards to battle and murder. Hence, in this article we will try to determine joint patterns and images in the songs of battle and murder. This article will examine in fact the kind of technique dengbejs employ in order to relate/narrate and which images they transmit in the course of a mourning song. For this study we have selected six songs of mourning, which are related to battle and murder. The songs which we have decoded are these: Şahîno, Qasimo, Silêmanê Emer, Bavê Koroxî, Hesenê Mala Mûsa and one of Huseyno’s songs which is about the murder of a soldier from Gimjim.

**Keywords:** Dengbeji, Song, Battle, Murder, Mourning.

## **Destpêk**

Ji çanda devkî derbasbûna çanda nivîskî ji bo her gelek di wext û astên cuda de pêk hatiye. “Kurd heta serdema modern jî mesafeya di navbera xwe û nivîsê de parastine” (Taş, 2014, r. 15). Ev mesafe ne bi awayek bi dilxwazî lê ji ber şert û mercên cuda derketiye holê. Ji ber vê yekê Kurd giraniya çanda devkî heta van salên dawî jî parastine. “Kurd gelek agahiyên dîrokî ji berhemên çanda devkî, zêdetir jî ji dengbêjan hîn bûne” (Taş, 2015, r. 17).

Dengbêj, bûyerên ku civak şahidiya wan kiriye di navbera nişan de neqil dikin. Di nav van bûyeran de şer û kuştin jî hene. Kilamên bi temaya şer û kuştinê di derheqê civak, serdem û çawaniya bûyera ku tê vegotin de jî agahiyên dide me. Em bi saya van kilaman bûyerên ku di bîra civakê de cih girtine hîn dibin. Bi analîza kilamên şer û kuştinê em ji aliyekî ve ji bîra civakê haydar dibin, ji aliyekî ve jî em sekinîna dengbêjan ya li hemberî bûyerên civakî dibînin. Li gel vê em dixwazin tesbît bikin gelo dengbêj bûyereke civakî ya ku temaya wê şer û kuştinê e çawa pêşkeşî civakê dikin û ji ser kîjan sembolen civakî ve kilamên şer û kuştinê tên gotin.

Li gor qeneeta me kilamên dengbêjan yê li ser şer û kuştinê ji aliyê gotinê ve xwediyê hevpariyên in. Em di kilamên şer û kuştinê de dibînin ku dengbêj wek berdevkê civakê, lehengên îdeal diafirînin û li aliyê din jî kesên xirab yê civakê (an jî civakê bi xwe) rexne dikin. Ev hêmanên hevpar bi gelemperî di qada teswîrên lehengan de, kesên baş û yê xirab de, eşîran de, dewlet û civakê de dertên pêş.

Em ê di vê xebatê de kilamên ku li ser şer û kuştinê hatine gotin wekî “kilamên şînê” bi nav bikin. Di beşa destpêkê de dê li ser girîngî û taybetiyên dengbêjîyê bê rawestan. Di beşa yekem de wek cure, dê zêmar û kilamên şînê ji aliyê taybetî û hevpariyên tematîk ve bîna nirxandin. Di beşa dawî de jî em ê şeş kilamê dengbêjan yê ku li ser şer û kuştinê hatine vegotin û di bîra civakî de xwedî cihê in, ji aliyê teswîrên hevpar, herikîna bûyeran, peyv û qalibên hevpar ve analîz bikin.

“Gotin” di dîroka mirovahiyê de xwedî cihê gelek kevin e. Barry Sanders girîngiya “gotinê” wiha diyar dike: “Mirov, ne ji ber ku dikare alet bi kar bîne, lê bi saya gotinê bû mirov. Tiştê ku mirov dike mirov ne birêveçûna tîk, ne ji binê erdê derxistina xwarinê û ne ji behremendiya şerê ye; mirov bi axaftinê dibe mirov” (Sanders, 2016, r. 13).

Peywira gotinê wek hêmanekî çandî ji bo mirovahiyê ew e ku tecrîbeyên civakên kevneşop/kevneperest ya hezar salî veguhastiye. Lê belê bi îcada çapxanê re hikumdariya nivîsê dest pê kiriye û ji çanda devkî gelek mînak wenda bûne.

Di nav berhemên çanda devkî yê Kurdan de herî zêde dengbêjî derketiye pêş. Dengbêj, bûyer û qewimînên civakê çî şîn û çî şahî be bi rêya muzîkê

digihêjînin nifşên nû. Dengbêjî ji vî aliyî ve di navbera dem û nifşan de wezîfeya pîrekê dibîne. Bi rêya vê veguhastinê civak dibe xwedî nasname û bîra hevpar. “Îcrakar, yanê dengbêj, kilamên xwe bi rêya çavdêrî û ceribînên xwe bi awayekî rast dihone û gelek xetereyên dîroka nivîskî berteref dike” (Taş, 2015, r. 21). Nivîs dirokeke sabît û tomarkirî diafirîne lê belê dengbêj di pêvajoya afirandina dîrok û bîrê de bi varyantan hereket dike. Di encama vê yekê de dengbêj ji nû ve afirandinê pêk tîne. Kubilay Aktulum di derheqê ji nû ve afirandina berhemên çanda devkî de wiha dibêje:

Ji nû ve sazkirina berhemeke çanda devkî bi saya guhdarîkirina vebêjer ya ji versiyoneke ewiltir pêk tê; ev ji nû ve sazkirin girêdayî asta gotinê ya berhema ku tê guhdarî kirin e; bi gotineke din îcraker, di dema guhdarîkirinê de hêmanên ku li gor xwe hêja dibîne dibijêre û van hêmanan ji nû ve diafirîne (Aktulum, 2013, r. 47).

Di berhemên devkî de bi demê re şaxên kilaman çêdibin. Li gor şaxan di berheman de bi demê re guhertin çêdibin. Wek mînak, kilama “Ehmedê Mala Mûsa” di sala 1943an de weke nivîskî di kovara “Ronahî” de hatiye çapkirin. Lê di şaxên ku paşê hatine gotin de gelek guherandin çêbûne” (Çifçi, 2014, r. 27). C. Allison li ser varyantan diyar dike ku “metna devkî di gotina duyem de tu wext wek ya berê nîne” (Allison, 2007, r. 54).

Di hunera dengbêjiyê de mijarekê din ya girîng jî dubare ye ku ev yek taybetiyekî sereke ya çanda devkî ye jî. Dengbêj, her tim gotinên bi qalib bi kar tînin. Em vê yekê dikarin di hunera dengbêjiyê de wek mezmûnên hevpar jî şîrove bikin. Ev yek jiberkirina kilaman hêsantir dike. “Dubare di çanda devkî de e mirovan bi efsûn dike” (Sanders, 2016, r. 23).

Wek berhemek çanda devkî dengbêjî, di pêvajoya afirandina kilamekê de xwedî taybetiyan e. Tekin Çifçi di kitêba xwe ya bi navê *Kilam û Jin* de balê dikişîne pêvajoya afirandina berhema devkî, ji bo nîşandayina vê yekê jî di navbera nivîskar û vebêjerê devkî de muqayeseyek dike.

Di wêjeya nivîskî de nivîskar di odeya xwe de, di nav cihana xwe de ye. Di pêvajoya afirandina berheman de xweser e. Dikare berhemekê, beriya ku biweşîne, deh caran xera bike û ji nû ve lê bike. Ji bandora civakê ya rasterast dûr e. Lêbelê piştî ku pêûsa xwe danî û pê ve êdî tu tîkiliya nivîskar û berhemê namîne. Di wêjeya devkî de guhdar û vebêj di heman demê de dijîn. Lewma jî derfet û mafê xerakirin û ji nû ve çêkirina berhemê nîn e (Çifçi, 2014, r. 26).

Dengbêjî gelek caran- bi taybet di qada dîrokê de- li hember fermiyetê cih digire. “Ji ber vê yekê jî, dîroknûsî, bi dîroka devkî ve ji zemînê meseleyeke

leşkerî û siyasî derdikeve û dibe meseleyeke civakî” (Gürtür, 2014, r. 13). Di hunera dengbêjîyê de tecrube, bîra hevpar û bîra şexsî di heman peywendê de rastî hev tên û ev yek jî beramberî rastiye dîrokî tê.

Dengbêj wek nûnerê çanda devkî hunera xwe di nav çanda xwe ya civakî ya resen de îcra dikin. Dengbêj performansên xwe bereksê mekanên çêkirî yên îro di mekanên xwe yên xwezayî de pêşkeş dikin. “Bi saya dengbêjan di jiyana gundan de ku li dor cotkarî, ticaret û koçeriyê şêkil digire atmosfereke manewî ya ku dengbêj li gundan diafirînin peyda bûye û girseyekê ku gihiştîye hestên hevpar çêbûye. Yên ku tên vegotin çîroka hemû kesên li wir e” (Taş, 2015, r. 25). Ji vê mekanê ku guhdarvan lê berhev dibin û guhdariya dengbêj dikin re “şevbiherk” tê gotin. Li ser têkiliya mekan û wateyê Ong wiha dibêje:

Di çanda devkî de peyv wateya xwe jî mekana ku tê de tîr emilandin distînin. Ev yek wekî ferhengane bi peyvên din re na, lê belê bi tevgerên dest û mil, bi guherîna dengê, îfadeyên rûyê û hemû tiştên di dema gotinê de pêk tîr. Peyv her çî qas li gor demên borî be jî, jî ber ku ev êdî nayê zanîn, di dema gotinê de her tim wek dema niha tîr gotin (Ong, 2014: 64).

Dengbêj ji aliyê mijarê ve xwediyê repertuareke dewlemend in. Em dikarin bibêjin ku mijarên wek evîn, şer, lehengî, şîn, qewimînên xwezayî, tîkiliyên etnîk mijarên sereke ne. Dengbêjî wek cureyeke reddiyeyê bi giştî gilî û gazin û nerazîbûnê îfade dike. Di kilamên dengbêjan de dixuyê ku li desthilatan; çî dewlet, çî axa û hikûmdar bin rexneyên tûj tîr kirin. Li gel vê ev yek carna bi forma nîfirê jî tîr honandin. “Dengbêj wek îfadeya razîbûnê dua û ji bo gilî û gazindên xwe jî gelek caran serî li nîfiran didin” (Kardaş, 2017, r. 166). Di kilaman de ji erdnîgarî û xwezayê jî gelek mînak tîr dîtin wek; çiya, deşt, çem, dar û ber û hwd.

Li ser erdnîgariya ku dengbêj hunera xwe îcra dikin û çend taybetiyê van herêman de Zelal Özagaçanlı wiha dibêje:

Dengbêj xwe li erdnîgariyên cuda cuda nîşan dane. Herêma Serhedê (Qers, Erdexan, Îdir, Agirî, Mûş, Erzirom) ji bo dengbêjan wek navenda bingehîn dikare bê dîtin. Şert û mercên îqlîmê û deverên bilind yên vê heremê ji bo dengbêjan sedemê îlhamê ye. Rîtmî kilamê dengbêjên Serhedê êdî lez û tîz e. Ji bo vê terzê mînaka ewil Şakiro ye. Ji ber cudabûna devoka Mêrdînê rîtmî kilamê dengbêjên Mêrdînê hêdîtir e. Mînaka vê heremê jî Huseynê Farê ye.<sup>1</sup> Li herêma Amedê jî rîtmekê êdî herikbar heye. Rîtmî vê meqamê nerm e û piştê dengbêjên Serhedê xwedî dengbêjên girîng e. Meqamên

<sup>1</sup> Di vê jêgirtinê de herêma dengbêj Huseynê Farê xelet hatiye diyar kirin lewra Huseynê Farê ji Mêrdînê ye, ew jî Amedê ye.

herêma Êlihê jî di navbera meqamên herêma Amed û Serhedê de ye. Karapêtê Xaço jî girîngtirin dengbêjê vê herêmê ye (Özağaçhanlı, 2012, r. 789).

Tradîsyona dengbêjiyê bi rêbaza hoste û şagirtiyê berdewam dike. Bi vê rêbazê şagirt her tim li cem hosteyê xwe dimîne û hemû hûrgiliyên dengbêjiyê fêr dibe. B. Sanders li ser perwerdeya çanda devkî wiha dibêje:

Mirovên ku di çanda devkî de dijîn zehf tişt fêr dibin, dibin xwedî agahî û vê agahiyê diemilînin. Lê vê zanebûnê bi awayê ku em dibêjin “xebat” bi dest naxin. Ew ligel hoste bi têkiliyekî nêzik ya şagirtiyê; bi guhdarîkirinê, dubareyê û bi ji berkirin û lihevanîna pêşgotinan fêr dibin. Ew bi hinek agahiyê xwe yên qalibî û di nav bîranînên kolektîf de fêr dibin” (Sanders, 2016: 30).

### 1. Ji Aliyê Taybetî û Hevpariyên ve “Zêmar” û “Kilamên Şînê”

Mirov ji berê heta niha li ser derd û keserên xwe yan jî li ser derdora xwe lorandine. Şîn wek gelek ritûelên civakî encama bihevrebûna mirovan e û bi qasê dîroka jiyana kolektîf jî kevin e.

“Qralê Urukê Gilgamêş ji bo hevalê xwe Enkidu şîn datanî û li ser dilorand. Sumerî, ji bo miriyên xwe heft roj û heft saet merasîma şînê dikirin. Bi taybet di dema definkirinê de kesên ku wek kar lorîk digotin li gel rahib û muzisyenan xwe davêtin erdê û helbest dixwendin” (Kaya, 2014, r. 305).

Aşkera ye ku her civak di derbarê şînê de li gorî bîr û bawerîya xwe ritûelên cuda pêk aniye. Şîn, wek peyv di ferhenga Zana Farqînî ya Kurdî-Tirkî de bi wateya xwe ya Tirkî *yas*, *matem* hatiye pênasekirin (Farqînî, 2011, r. 638).

Ji kilam ango helbestên ku di dema şînê de bi aheng tê gotin re zêmar jî tê gotin. Di ritûelên şînê de tê dîtin ku kesên zêmar dibêjin –bi taybet jin in- medha kesên mirî dikin û vê yekê wek kar pêk tînin. Lêbelê îro ev çand jî holê rabûye û herçend yek bi yek cîh negire jî îro dengbêj kilamên şînê dibêjin. “Şîn, her çend cureyeke edebiyata gelêrî be jî ji aliyê dengbêjan ve jî hatiye gotin” (Kardaş, 2017, r. 150).

Zêmar, cureyeke helbesta Kurdî ya gelêrî ye ku hestan bi awayekî mûzîkal tîne ziman û di vê pêvajoyê de têkiliyên merivatî, piştevanî û yekbûyîna derdixê pêş. Zêmar bi şeweyekî jixweberî tê gotin bi heman awayê em dikarin bibêjin ku kilamên dengbêjiyê yên şînê jî bi awayekî jixweberî tê gotin.

Zêmar, bi wateya xwe ya teng helbestên ku li ser mirinê hatine gotin, bi wateya xwe ya fireh jî helbestên ku li ser hemû mijarên bi êş hatine gotin e. Nexweşî, derketina

bûkan ya ji malê, çûyîna leşkeriyê, bindestbûyîna welat  
ango tarûmarkirina wî, qeza, hesret, afetên xwezayî,  
mirina ajalên ku ji wan tê hez kirin jî wek cureyên  
zêmarê tîn dîtin (Kaya, 2014, r. 302).

Di civaka Kurdan de herwiha di civakên cînar de zêmar, exleb ji aliyê jinan ve tîn gotin. Christine Allison, li ser hilberandina zêmaran ya jinan tesbîtekê sosyolojîk dike û vê yekê wek taybetiyeye civakên pêderşahî dibîne. “Zêmar” ku di civakê de wek nîşaneyê bêçarebûn, lawazî tê dîtin, lorikên zarokan yên ku hesta dilovaniyê dihewînin ji ber ku ji aliyê mêrê “maço” ve nayên pêşkeşkirin ev qad wek cihê îcraya jinan dertên pêşiya me” (Vgh. Alkar, 2012, r. 406).

Zêmar bi gelemperî ji ber sedemên cudabûnê tîn gotin. Kilamên dengbêjan yên şînê jî bi heman awayê li ser rewşên dramatîk yên wek mirin, cudabûn, evîn û hwd. tîn gotin. Dengbêj di kilamên xwe de gelek caran şîna rêberên civakê digirin ku exleb bi bêbextî tîn kuştin. Ev cure kilam wek şêwe pêvajoya ku leheng tê kuştin bi awayekî teswîrî û kronolojîk ifade dikin. Eger ku leheng bi awayekî xedar hatibe kuştin nefreta li hember kujer û malbata wî tê gotin. “Gelek caran ji bo ku kesê mirî neyê jibîrkin dengbêjekî tê wezîfedar kirin û li ser kesê mirî kilam tê gotin. Di zêmarên bi vê awayê de dengbêj zêmarê bi taybet ji devê dayika kesê ku hatiye kuştin dibêje” (Kızıldemir, 2002, r. 395).

Li gel van mijaran di nav Kurdan de şerên di navbera eşîran de ku di encamê de gelek kes tîn kuştin jî mijarê kilamên şînê ne. Di van cure kilaman de rûmet, cesaret û lehengiya malbat an jî eşîrê bi awayekî efsûnî tê vegotin; herwiha kesên din dijber jî bi nefret û xirabî tîne teswîr kirin. Li gel van yekan em dibînin ku mijarên penaberî û sirgunê jî di kilamên şînê de dixuyên. Çîroka kesên ku bi sedemên aborî û siyasî koçber dibin û li welatê xerîbiyê dimirin bi awayekî dilşewat tê gotin. Mijarekî din ya ku di kilamên şînê de dixuyê jî leşkerî ye. Tê zanîn ku wextê berê xizmeta leşkeriyê bi salên dirêj devam dikir û ji xortên ku diçûn leşkeriyê tu agahî nedihat sitandin û gelek caran jî ew xort venedigeriyan.

Dengbêj bi hunera xwe bîra civakê ya dîrokî zindî dihêlin. Ji vî aliyê ve hinek kilamên şînê trawmayên civakê jî didin der. Kilamên şînê li ser guhdaran ango civakê hestên wek lehengî, tohlildan û hesretê peyda dike. Kilamên şînê bi dengê zîz û dilşewat tîn gotin. Dengbêj di dema gotina kilamên xwe de hunera vegotin û retorîkê di astên herî jor de bi kar tînin. Di kilamên dengbêjan de temaya serdest çî şîn çî mijarên din bin, hinek hunerên edebî tîn emilandin. Wek mînak di kilaman de herî zêde ev huner tîne emilandin; teşbîh, teşhîs, telmîh, mubalexe, hûsn-i talil, tecahûl-i arif. Ev yek ji aliyekî ve bandora li guhdaran zêde dike ji aliyekî ve jî di bîrê de cihê xwe qaîm dike.

Piştfî diyarkirina van taybetiyan em ê li ser kilamên şînê rawestin û taybetiyên ku di vê beşê de hatin rêz kirin di kilaman de peyda bikin.

## 2. Di Kilamên Dengbêjan de Hêmanên Hevpar ên Şînê

Em ê di vê beşê de ji kilamên dengbêjan yên ku tê de hêmanên şîn û xemgîniyê derbas dibin mînak bidin. Kilamên ku em ê mînak bidin kilamên şer û kuştinê ne. Taybetiya van kilaman ew e ku di bîra civakê de cîh girtine. Di van kilaman de leheng ji ber sedemên curbicur tînin kuştin. Kuştina lehengan ya bi şikleki xedar di navenda bûyeran de ye. Em ê van kilaman ji aliyê hêmanên şînê yên hevpar û awayê vegotinê ve jî binirxînin.

Kilama ku em ê pêşî li ser rawestînin kilama bi navê “Şahîno” ye. Me vê kilamê ji gotina dengbêj “Zulfikar” deşifre kir. Kilam wiha ye:

“Şahîno”<sup>2</sup>

Dê heyyyyy..

Heylo mala bavê min şahîno looo...

Wê şahînooooo... payîza me hatî hewa saree

De mi dî sehera sibê bû

Ji bo sînorê erda bû

Şahîne mi pevçûn derxistin berê xwe dan mal

Ê de birayy agirkî bikev mala Hesene Elî

Li pozê guhirê gulekî lê dane li bejn û balê Şahîne min î delalî

Weyla li min korî xeberek hatî dibê ji qefesa singaa xwe da birîndarî looo...

Ê de heylêee heylêe heylêe hey lo loo hey lo mala bavê mi Şahîno looo... axx..

Wî Şahînooo... çiyakê bi ser me de bişewite bi dar eeee... ax..

Lê min ê xeberkî girtî dibê Şahîne te birîndareeyy..

Mi dî can û cinazê Şahîne dane serê çar dara yavaş yavaş tîne ber bi malêe

Wî Şahîno te dilê mala diya xwe şewitaaand ocaxê mi kor bî lawoooo...

Weyla mala giraan bê xwedî û lo bê sermiyaaan looo...

<sup>2</sup> <https://www.youtube.com/watch?v=oi4vCb0Pc2Y>



Ê de heylêê... heylêê. Heylooo.. ê de heylo mala bavê  
mi Şahîno loo..

Xemê dilê dêka te tunebûu loo.axx..

De wezê pê hesiyam dibên Şahîne te birîndareeyî

Mîn ê porê serê xwe rûçikan li çok u cîyê xwe  
daa..oooo...

De mi dî Şahîne mi serê xwe danî ser çoka dayika xwe ya  
rebennn...

Weyla li pişt û balê xanima dilê xwe mêze kiruu..hasretê  
kişaaand canê xwe daa...

Ê de heyloo heyloo heyloo heylo lo heylo... heylo mala  
bavê mi Şahîno loo...

Wê Şahinoo zivistana me hatî berfê lê kîr

Lê mi dî qaz û quling neman li zozana xwe berdan derya  
jêrîn

Wa heywana hêlina xwe rast çêkir

Wî Şahîno te tenê pişt xwe dayî axê kendala oooo..

Bûka çardeşevî bi tevê xeml û xêza bûkanî vee.

Weyla tilî piçikê henekirîî... heyla lê xanima dilêê xwe  
teslîmî kîr loo..

Ê de heyloo heyloo heyloo heylo lo heyloo ... heylo mala  
bavê mi Şahîno loo...

Wê Şahînoo îro dîsa diya te yê dil bigirêê.. oooo...  
Axx...

Dê wezê bala xwe dimê li ser dilê dêya te bûye sê çar  
tene girêê... axx..

Weyla li mi korê bav tune ye,

bira tune yee mamê wî tune ye pismamê wî tune  
yee..oyyy...

Ê de êl û eşîra mala bavê m jî dilsar e

De keskê tune here heyfa Şahîne mi bigrêê... oyy..

Ê de heyloo heyloo heyloo heylo lo heyloo ... heylo mala  
bavê mi Şahîno loo...

Wî Şahînoo derdê dilê dêka te pir bûne kula daye serê  
kulaaa... oyy.. axx...

Weyla mi dî ji xeml û xêza bûkaniyê xirabiyê şal û  
temeziya xwe berda nava milaaa

De wezê dikim bi destê Şahînê xwe bigirim herim ji nava  
gundê xayîmann

Weyla mislîmanî li me nakin sitariyêê em ê ji xwe ra xwe  
bavêjin nava gundê filaa

Ê de heyloo heyloo heyloo heylo lo heyloo... heylo mala  
bavê mi Şahîno loo...

Temaya vê kilamê mirin e û girêdayê vê jî şîn û xemgîniyê bi aheng îfade dike. Di kilamê de kuştina lehengê bi navê “Şahîno” mijara sereke ye. Di kilamê de heyf anîn, nifirkirina li hember kujerên Şahîno, teswîrên lehengtiya “Şahîno” û li hember vê kuştinê rewşa dayika “Şahîno” tê vegotin.

Kilam bi keserê dest pê dike. Em dikarin gotina ku di destpêka kilamê de wek “Heylo mala bavê min şahîno loo...” hatiye gotin wek heyfanîn û destpêka xemgîniyê bixwînin. Di vir de forma “mala bavê min” ê guhdarvan hişyar dike ku bûyerekî xemgîn qewimiye. Di van cure kilaman de kuştina lehengan bi “mal”ê re tê têkildarkirin. Li gor vê yekê kuştina kesekî ku bi taybet jî mêr be wek xirabûna “mal”ê tê îfade kirin; ev yek ji ber taybetiya civaka pêderşahî tê. Di civakên pêderşahî de “mal” li ser piştava mêr ava ye, mala bê mêr wek malekê bê sitûn tê dîtîn. Ji ber vê yekê di kilamên dengbêjan de jî xemgîniya li hember mirin ango kuştina lehengê mêr pêşî bi xirabûna mal û ocaxê ve tê teswîr kirin. Ev mînaka ji kilamê vê yekê baş îfade dike: “wî Şahîno te dilê mala diya xwe şewitaaand”. Herwiha dîsa ev gotina kilamê jî tesbîta me piştrast dike: “weyla mala giraan bê xwedî û lo bê sermiyaaan loo...” Bi vê awayê em dikarin forma “mala bavê min...” wek hêmanekî sereke yê kilamên şînê diyar bikin.

Hêmanekî din ya ku em dikarin wek hevpariyekî kilamên şînê diyar bikin forma “agir bikeve mala...” ye. Ev form di kilaman de ji neyaran re, fesadan re, axayan re, ji dewlet û nûnerên wê re, ji qatilan re û hwd. tê gotin û em dikarin bibêjin ku rasterast nifire jî. Di vê formê de jî têgeha navendî dîsa “mal” e û xirabûn ango şewitîna wê ji xwedê tê xwestin.

Piştê van forman dengbêj xebere kuştina leheng dide: “Li pozê guhirê gulekî lê dane li bejn û balê Şahînê min î delalî...” Ji vê gotinê em dikarin behsa formekê din bikin ku ew jî bi guleyê re têkildar e. Leheng gelek caran an li nava meydanekê an jî li cih û warekî tenha tê kuştin. Dema ku em bala xwe didinê leheng bi gelemperî bi guleyan tîna kuştin ango tê birîndarkirin û birînê wan

xedar e. Her wiha di vê formê de qaliba “bejn û bala...” jî wek teswîra leheng tê gotin û hêmanekî hevpar yê kilamên şînê ye.

Di vê kilamê de peyva “birîndar” jî gelek caran tê dubare kirin. Ev peyv jî ku rewşa beriya mirina leheng îfade dike wek taybetiyekî hevpar ya kilamên şînê ye. Li gel van di vê kilamê de gotina “lê min ê xeberkî girtî...” jî formekî taybet e ji bo kilamên şînê. Em dikarin vê formê wek destpêka aksiyon û tevgerê jî bixwînin. Ev, xebera reş ku di kilaman de bi piranî wek “ji min re xeberekî hatî, min xeberek girtî, xeberekî anîn, xebera nexêrê û hwd.” tê emilandin.

Em dibînin ku di gelek kilaman de jin li hember rewşa mirinê porê xwe dirûçikînin. Ev yek li hember êşa mirinê wek bertekekê ye ku jin bi vê yekê canê xwe diêşînin. Di vê kilamê de jî bi vê şiklê hatiye gotin: “Min ê porê serê xwe rûçikan.” Herwiha ji vê gotinê diyar dibe ku vebêjerê vê kilamê jin e.

Gelek caran di kilamên dengbêjîyê de teswîrên demsalan tînin kirin. Em dikarin bibêjin ku di kilamên şînê de bi taybetî teswîra demsalên zivistan û payîzê tînin kirin, girêdayê van jî bi temaya mirinê re eleqedar behsa “sarbûnê” tînin kirin. Ev teswîr di kilaman de wek; “payîza sar, zivistana sar, çemê sar, axa sar û hwd.” tê emilandin. Di vê kilamê de jî li ser zivistanê wiha hatiye gotin: “Wê Şahinoo zivistana me hatî berfê lê kîr...” Di dewama kilamê de jî wek hêmanekî jihevqetandinê “ax” wiha derbas dibe: “Wî Şahîno te tenê piştî xwe dayî axê kendala.”

Hêmanekî din ku em di kilamên şînê de rast tînin di derheqê “çavê” de ye. Exleb vebêjerê kilamê li hember rewşa mirinê dixwaze kor bibe lewra kesê ku jê hez dikir hatiye kuştin û êdî dinya li ber çavê wî reş e. Ev daxwaz di kilaman de wek; “çavê mi kor bin, “çavê dayka te kor be” “weyla korê û hwd.” tê emilandin û em dikarin wek formekî hevpar ya van kilaman diyar bikin. Di kilama Şahîno de jî bi vê şiklê hatiye emilandin: “Weyla li mi korê...”

Formekê din ya ku em bi taybet di kilamên şer û şînê de rast tînin daxwaza heyf-ango tolhîlanînê ye. Ev yek di kilaman de wek “hîlanîna heyfa xwînê” tê ditin û vebêjerê kilamê ji eşîra xwe, ji mêrê mala bavê xwe, birayê xwe daxwaza heyf-hîlanînê dike. Ev yek di kilama Şahîno de bi awayê gazindê hatiye gotin. Vebêjer ji ber tunebûna kesekî ku heyfa Şahîno bistîne bi gazind e. Di kilamê de ev beş wiha ye:

Weyla li mi korê bav tune ye,

bira tune yee mamê wî tune ye pismamê wî tune  
yee..oyyy

Ê de êl û eşîra mala bavê m jî dilsar e

De keskê tune here heyfa Şahînê mi bigrêê...

Her wiha di van cure kilamên ku ji vê xebatê re bûne mijar de gotin û qalibên ku bi “dê/dayik” re eleqedar in jî tîn dîtin. “Dê” ango “dayik” di formên wek “dayika te kor be, dilê dayika te..., dayik bi gorî û hwd.” tî emilandin. Di vê kilamê de jî “dê” bi van şiklan hatiye emilandin:

(...)Wê Şahînoo îro dîsa diya te yê dil bigirêê

(...)De mi dî Şahîne mi serê xwe danî ser çoka dayika xwe ya rebennn..

(...)Wî Şahînoo derdê dilê dêka te pir bûne kula daye serê kulaaa

Li gor van yekan di kilama Şahîno de hêmanên ku şîn û xemgîniyê temsîl dikin hatin şîrove kirin.

Kilamekê din ya ku ji bo vê xebatê hatiye bijartin kilama “Qasimo” ye ku me ji dengê Şeroyê Biro deşîfre kiriye.

### “Qasimo”<sup>3</sup>

Qaaasimooo... Heyla lo lawoo... dilê dayka te hawarê vê gaziyêê...

Dêranim lawo dilê dayka te hawarê vê gaziyêê...

Cerda mala Şêgo giran e bila xêrê ayê nebîne

Şeveqda gurê sibatê xwe danînee

Gulekêê li nava meydanê berî bedena Qasimê lawê meyro serekê siyara gula nêçîrvana dane

Qasimo menaal bexê mino menaal çavê reş belekê meke kendal

Şevêk şevê payîza wezê li ber serê birîndarê mala bavê`x

dêêranim lawo bûme cî û belgî û berpâl

Qasimooo.. lo heyla lo lawoo.. bihara vî welatî çî qa zû tî

dêêranim lawo bihara vî welatî çî qa zû tî êê...

erdî kose ye erdî pasax e weyla lo lawoo.

Cerda mala Şêgo bila xêrê ayê nebîne

Şeveq da gurê sibatê zûzû bûnee (.....)

<sup>3</sup> <https://www.youtube.com/watch?v=wkt34FyUsGU>

Qasimo menaal berxê mino menaal çavê reşbelekê meke  
kendal

Şevê şevê payîza wezê li ber serê birîndarê mala bavê`x  
dêêranim lawo bûme cî û belgî û berpâl

Qasimoo weyla lawo dilê dayka te kanî gazê berwarê  
dêêranim lawo dilê dayka tê kanî gazê berwarê

Kerîpergelê Qasimê lawê Meyro giran e

Kerîpergelêê Qasimê lawê Meyro serekê sîyara gula  
nêçîrvana giran e dêêranim

De şevê şevê payîza wezê li ber serê birîndarê mala  
bavê`x rûniştîme

Dikim nakim dêêranim lawo birîna kûr e kew lê nayê

Qasimo menaal berxê mino menaal çavê reşbelekê meke  
kendal

Şevê şevê payîza wezê li ber serê birîndarê mala bavê`x  
dêêranim lawo bûme cî û belgî û berpâl...

Kilama Qasimo kilamekê şîn û xemgîniyê ye ku ji aliyê dengbêjên cuda ve hatiye gotin. Di navenda kilamê de kuştina lehengê bi navê “Qasim”o heye. Di vê kilamê de jî atmosfera şînê li dor têgehên birîndarbûn, mirin û gazindê hatiye honandin.

Hêmana ewil ya ku em di destpêka kilamê de rast tînin wek îfadeya keser û hesretê “heyla lo lawiko” û di pişt re jî “dayîk” e ku bi vê formê hatiye emilandin: “*dilê dayka te hawarê vê gaziyeêê...*” Di vir de em dikarin bibêjin ku vebêjer ê guhdarvan amade dike ango pê dide zanîn ku temaya vê kilamê şîn e. Di destpêkê de em dibînin ku hêmanên hevpar yê kilamên şînê dayik, hawar, gazî hatine emilandin. Emilandina hêmana “dayikê” di kilamên şînê de ji ber dilovanî û dilzîzbûyîna wê ye. Herwiha forma vegotinê ya ku dayik bi xwe vebêjer e ango bi êşê re tê îfade kirin li ser guhdaran jî bandorekî cuda dihêle.

Wek ku di kilama “Şahîno” de jî hatibû dîtin di kilamên şînê de demsalên payîz û zivistanê dertên pêş. Di kilama “Qasimo” de teswîrekê bi demsalê re têkildar heye ku wiha ye: “*gurê sibatê xwe danînee.*” Ev şibandin ji bo neyaran ango kujerên “Qasimo” ye. Li gel vê yekê qalibekî din ya ku girêdayê demsalê di kilamê de tê dubarekirin ev e: “*Şevê şevê payîza wezê li ber serê birîndarê mala bavê`x...*” Teswîrên demsala payîzê gelek caran bi xemgîniyê re têkildar e, di kilamên şînê yê dengbêjan de jî ev taybetiya payîzê ya, “bêdengî, xemgînî, tenêbûn” tê emilandin.

Di dewama kilamê de em dibînin disa wek hêmanekî hevpar “nifir” li neyaran tê kirin. Ev yek di kilamê de wiha tê dîtin: “*Cerda mala Şêgo giran e bila xêrê ayê nebîne.*”

Di berdwamiya kilamê de ji hêmanên hevpar yên kilamên şer û şînê “gule” û “meydan” tîn dîtin. “Gule” dîsa wek destpêka aksiyona vegotin û bûyerê tê dîtin. Herwiha ji bo peyv an jî motîfa “meydan”ê jî em dikarin li dor têgehên wek “mêranî, merdî, hêz, îqtîdar, wêrekî şêr(bûn)”ê şîrove bikin. “Meydan” di honandina kilamên şer û şînê de ji bo pesindayîna lehengê kilamê hêmanekî girîng e.

Birîn û birîndarî jî wek hêmanekî hevpar di vê kilamê de dertê pêşiya me. Di kilamê de” kew lê nehatina birînê” wiha tê gotin: “*Dikim nakim dêranim lawo birîna kûr e kew lê nayê...*” Wek li jor jî hate gotin birîn her tim “kûr û xedar” e.

Hêmanekî din ya ku di piraniya kilamên şer û şînê de dixuyê peyva “dêran” e ku exleb wek “dêran im” tê emilandin. Ev peyv tê wateya “perîşanî, talanî û wêranîyê.” Li gel vê em gelek caran rastê peyva “nemînim” jî tîn ku bi vê peyvê vebêjer îfade dike ku li dû piştî mirina kesê ku jê hez dike êdî naxwaze bijî û êşa xwe yê bi tenê mayîne îfade dike.

Hêmanekî din ya ku di vê kilamê de dixuyê “belgî û beralp” e ku, vebêjer dixwaze ji kesê birîndar re bibe belgî û beralp. Li gel belgî û beralpê di hinek kilaman de jî “doşek” derbas dibe ku xemgînî, nexweşî û birîndariyê îfade dike.

Kilamekî din ya ku me ji bo vê xebatê bijartiye kilama “Dengbêj Huseyno” ye ku li ser kuştina leşkerekî hatiye nivîsîn ku ji navçeya “Gimgim”ê ya li ser Mûşê ye.

### **Dengbêj Huseyno**

Kewê dibê rabe îro dilê dayka te rebenê<sup>4</sup>

Gelo lawo mîna mîya ji êvarê hetanî sibê li ser berxê kaleee kale...

Lawo payîz e eskerê xelqê hatin teskerê xwe sitandine hatineee male

Ezê di nav teskereciya de çavê xwe digerrînim nagerînim

îro nabînim bejn û bala Heyderê xwe delalee...

Têlqrafe ji enqera şewitî hatî go Elî mala te xirabe gelo bi cotekî kêra birîndar eee...

Ji êvarê hetanî sibê xestexana Enqerê da

hidura wî ber birînê wî tunîne lawo naleee nale...

<sup>4</sup> [https://www.youtube.com/watch?v=7cX-\\_AgzJ4Y](https://www.youtube.com/watch?v=7cX-_AgzJ4Y)

Kewê dibê law Fatimê xwezil ji xêra mala xudê re ez ê qasekî li xestexana Enqerê da

Ji birîndarê mala bavê te re bûma doşek û belîf law jê ra bibûma beerpaleee...

Ax lawoo lawoo bê Heyderê'm lawoo...

Bê heylo lo lawo bê heylo lo lawoo mi nedîto mi nebînaww...

Yazixê cinazê eskerê xestexana Enqerê da bê xweyî mawoo berxêê...

dê rebenê lawooayyy..

Kewê dibê Heydero lawo sibe ye bi dîyarê Enqera şewitî bikevim bi darêê te re...

Payîz e eskerê xelqê tevanî sitandine teeskere

Gelo çavê mi li rêya berxê mi qerimî

îro ne kaxiz e ne meytûb e ne cewab e ne xeeber ee..

Têlqrafe ji Enqera şewitî hatî go Elî mala te xirabe gelo bi cotekî kêra bîrîndar e

Gelo derba kêrekê sûstalî ye derba ber pêşîra berxê mi xeeñçer e...

Kewê dibê hetanî sax bim li dinyayê ax bikim

Bibêjin sed heyf u sed yazixa Heyderê lawê Elî xortê qeemer e

Ax lawoo lawo lawo bê Heyderêem lawoo..

Bê heylo lo lawo heylo lo lawo mi nedîto mi nebînawwo

Yazixê cinazê eskerê xestexana Enqerê da bê xweyî mawoo berxêê...

dê rebenê lawooayyy..

Kewê dibê Heydero lawo sibe ye bi dîyarê Enqerê bikevim bi daraa bînee..

Ez ê çûme pêşîya teskereciya mi go bextê we xwedê ketime

gelo haya we ji heyderê mi tuunîne

Têlqrafe ji Enqera şewitî hatî go Elî mala te xirabe gelo  
bi cotekî kêra bîrîîndar ee.

Ca rabe here Enqerê îro cinazê berxê xwe bigree bîne

Lawo ji rebê mi ve bavê te dijminê berxê xwe nazz nake

Eger gava bavê te dijminê berxê xwe naz ke

sala sedî yekî be wê bavê te dijminê berxê xwe bikuje  
heyfa destêê xwe hilînee..

Ax lawoo lawo lawo bê Heyderêem lawoo...

Bê heylo lo lawo heylo lo lawo mi nedîto mi nebînawwo

Yazixê cinazê eskerê xestexana enqerê da bê xweyî  
mawoo berxêê... dê rebenê lawooayyy..

Kewê dibe Heydero lawo rabe îro dilê mi ji êvar da gelo  
kêree kêr e

Lawo eskerê xelqê tamamî teskerê xwe sitand teskerê wa  
daneee dêran

E çûme pêşiya teskereciya mi go bextê we xwedê ketime  
haya we ji Heyderê mi tunîne

Yekî ji mi re digot Kewê porkurê mi' b çavê serê xwe dî

Gelo dosyê Heyderê te li stenbolê danîne erdê teskera wî  
tije kirin daneee jê ra

Heyderê te hatî li Enqerê peya bû berê xwe da mala  
xaaaalê ra

Gelo hayê Heyderê mi ji bayê felekê tunîne

cotek dujminê kafir kete pêşya berxê mi

qe ji xudê netirsiyan îro we eskerê mi da ber bîçaxa li  
beer kêraaa...

Gelî bira rebê alemê vî derdê nişanî kesî nede ewladê  
merfa du sal eskerî' bke

Gelo kirne mînanî peza guraxwarî danîne nava tabûtê

dane ser piştê dolmîşê şandne Mûşa şewitî

gundê Vartoyê ez kalê bavê lawoo ez pîraa dê raa

Ax lawoo lawo lawo bê Heyderêem lawoo..



(Xudê ala qebûl neke înşalla)

Bê heyła lo lawo heyła lo lawo mi nedîto mi nebînawwo

Yazixê cinazê eskerê xestexana Enqerê da bê xweyî  
mawoo berxêê...

dê rebenê lawooayyy..

Kewê dibe Heydero lawo îşev li me hatî evar e gelo  
êvaraaaa îne

Kewê dibê Fatimê lawo l'te hêsîrê mi rebenê gelo Elî li te  
goooo îne..

Kewê dibê Fatimê Lawo îro tu'j daayîka xwe re bîne  
leganê şokê vê saabûnê

îro biray te ji rêya dûr tê biratî ye de raabe birînê berxê  
xwe bi destê xwe bişo

lawoo ji vêê xûnêê hayy..

Kewê dibê Heydero lawo îro diya te pepûka meha vê  
kaanûnê

Ez rabim herim Enqera şewitî deynim derê meclîsa  
mebûsa

Gelo destê xwe bavême bendê qaaanûnê

Dibêjin çar heb lîderê me heyê belkî li dinyayê qe xêrê  
neeebîne

Silêman Demirel mitefiqê Amerîqa ye tim u daim destê  
wî dirêj e yardimê jê diistîne...

Ecevit solci ye dixwaze qanûna Lenîn û Mao qomînîstê  
nava Rûs oooo Çînê

Nejmedîn erbaqan limêja sexte dike siyasetê kiriye  
aletaaa dînê

Qumandayê Turkeş Turkiye kirne mîna golaaa xwînê

Gelo malê bavê'm bi qurban be

Kenan Evren îkincî Atatürk wexta rabe serê xwe hiiiilîne

Ca bi destê vana bigre kelemçe'bke berê wa bide ûzinadê

Ancax eva heyfa xort û gencê me biiistîne..

Ax lawoo lawo lawo bê Heyderêem lawoo..

Bê heyla lo lawo heyla lo lawo mi nedîto mi nebînawwo

Yazixê cinazê eskerê xestexana Enqerê da bê xweyî  
mawoo berxêê...

dê rebenê lawooayyy..

Di navenda bûyerên vê kilamê de kuştina “Heyder” heye ku ew lehengê sereke yê kilamê ye. Ev kilam ji aliyê hêmanên şînê yê hevpar ve xwediyê dewlemendiyekê ye. Dema ku em bi gelemperî li vê kilamê dinhêrin dixuyê ku qewimîn ji aliyê dengbêj ve hatiye guhdarî kirin û honandina kilamê jî bi wê şîklê pêk hatiye. Ev yek di van gotinan de bi awayekî aşkera dixuyê:

“Yekî ji mi re digot Kewê porkurê mi”b çavê serê xwe dî

Gelo dosyê Heyderê te li stenbolê danîne erdê teskera wî  
tije kirin daneee jê ra

Heyderê te hatî li enqerê peya bû berê xwe da mala xaaaalê ra...”

Wek taybetiya ewil ya kilamên şînê ku di destpêka kilamê de dertê pêşiya me “dayik” e. Dayik bi vê şîklê hatiye bikaranîn: “*Kewê dibê rabe îro dilê dayka te rebenê...*” Wek ku di destpêkên kilamên din de jî hatin dîtin ev awayê destpêkê ê guhdaran hişyar dike ku bûyereki mirin yan jî birîndariyê qewimiye. Li gel vê di cihekî din de jî dayik dîsa wek temsîla perîşanî, rebenî û wêraniyê bi çûka pepûkê wiha hatiye teswîr kirin: “*Kewê dibê Heydero lawo îro diya te pepûka meha vê kaaanûnê...*”

Di dewama kilamê de dîsa wek demsal payîz gelek caran tê dubare kirin: “*Lawo payîz e eskerê xelqê hatin teskerê xwe sitandine...*” Di vir de payîz wek demsala vegeerê ango wek demekê libendêmayînê/çaverêkirinê hatiye teswîr kirin û mijara kilamê jî li vir dest pê dike: lehengê kilamê “Heyder” jî leşkeriyê venagere. Herwiha meha kanûnê (meha ewil ya zivistanê) jî di kilamê de temsîla zivistanê dike û bi atmosfera xemnak ya kilamê re têkildar e.

Di destpêka kilamê de qaliba nedîtina “bejn û bal” a leheng jî dîsa wek hêmanekî hevpar yê van cure kilaman e. Wiha hatiye emilandin: “*Îro nabînim bejn û bala Heyderê xwe delalee...*” Her çend di destpêkê de bûyer hêj nehatibe gotin jî nexuyabûna “bejn û bala” leheng di derheqê dewama kilamê de fikrekê dide guhdaran.

Ji bilî van em dikarin peyva “telqrafê” ku di kilamê de derbas dibe wek “xebera reş” şîrove bikin. Li gel vê di kilamên ku li ser serhildan, şer û şînê de tînin gotin de qaliba “enqera şewitî” jî gelek caran tê emilandin. Ev yek pêvçûna di navbera dewlet û Kurdan de diyar dike û her tim bûyerên xemgînî, trawmatîk û mirinê îfade dike. Di kilamê de ev yek wiha hatiye emilandin: “*Têlqrafe ji enqera şewitî hatî go Elî mala te xirabe gelo bi cotekî kêra bîrîîndar ee...*” Di vê

gotinê de “birîndarî” û qaliba “mala te xirabe” jî dîsa di kilamên şînê de hêmanên hevpar in.

Wek ku di şîroveya kilamên din de jî hatibû îfade kirin vebêjer dixwaze ji birîndar re bibe belgî û berpala. Ev daxwaz di vê kilamê de jî wek hêmanekî hevpar wiha hatiye emilandin: “*Ji birîndarê mala bavê te re bûma doşek û belîf law jê ra bibûma beerpalee...*”

Formekî din ya ku di vê kilamê de dixuyê û ku em dikarin wek hêmanekî hevpar îfade bikin jî ev e: “*Kewê dibê hetanî sax bim li dinyayê...*” Ev form îfade dike ku êş û xemgînî tu wext nayê jibîr kirin û di kilamên şînê de zêdetir tê gotin.

Daxwaza heyfhiilanînê jî di vê kilamê de tê hêmanekî din e ku hevparî nîşan dide: “*sala sedî yekî be wê bavê te dijminê berxê xwe bikuje heyfa destê xwe hilînee...*”

Hêmanekî din ya hevpar jî “por” e ku di vê kilamê de em rast tên. Por di vê kilamê de wiha hatiye emilandin: “*Yekî ji mi re digot Kewê porkurê mi’b çavê serê xwe dî...*”

#### “Silêmanê Emer”<sup>5</sup>

Ay lolo lo lo lolo lolo... lo Silêmanoooo...

Eve serê çendîkî çen şeva bî çen roja bî Silêmanê Emer kuştin lolo loloo...

Ez ê çibkim lolo loloooo... eşîra Torê binya Mêrdînê hêlayê bê ser û xudaoooo loyy..

De lo lo lo wezê halê xwe çawa kim

Rabû rextê milê va xorta kim

Heke mi heyfa Silêmanê Emer bilin kir

Ez ê çûme qesra (...) lolo silê lolo silê

Rêkekî lolo li ser rê re mi dî Silê bavê Emer borî siwarê hespê boz e xulam pê wî re

Çawa derbeka lê dane Silêmanê Emer lolo lo loo xûna wî nasekinêê

Heta dankî sibê lolo loo birîna xwîn tê der....

Ez ê gazî bikim xwişka te gotî gazî bikin

şêgokê hetanî bêgokê hekîmo lolo lolo looo hekîmê gundê mee oooo...

<sup>5</sup> <https://www.youtube.com/watch?v=pCNjZ3awfMs>

Ez bextê te me hekîmoo rabe qutî melhemê xwe bîne  
were mala mee..

Bes birînê Silêmanê Emer derman bike bê hîle oooo

Silêmanê Emer birînê wî derman bike lolo lolo looo  
hekîmoo bextê te me bê hîle ooo...

Ez ê bidim tevî garan û pezê lolo gundê me ooo...

Heke tu bê Silêmanê Emer derman bikî bê hîle waa..

Ez ê bidim te vî her sê zeriye lolooo qesrêê... oooo...

Lolo lolo lolo Silêmaanoo sembol sor o simbêl bi  
qîtaanoo

Derbekê lê dan Silêmanê Emer kuştin

eşîra Torê hêlayê bê ser u lolo bê sermîyanêê.. hêê..

Kilam li ser kuştina lehengê bi navê “Silêmanê Emer” hatiye gotin. Di navenda kilamê de birîndarbûna leheng, kuştina wî û teswîr û dîtînen li dor van rewşan hatiye vegotin.

Kilam bi gotina “*lo Silêmanoooo...*” dest pê dîke û wek ku di kilamên din de jî hate dîtîni di destpêkê de gotina navê leheng li gel “*lolo, lélé* û hwd” nîşaneyê qewimînên xem û eşê ye.

Li dû vê destpêkê dengbêj mijara kilamê aşkera dîke: “*Eve serê çendîkî çen şeva bî çen roja bî Silêmanê Emer kuştin lolo lolooo...*” Dengbêj ango vebêjer piştê vê, behsa wesfên leheng dîke û xemgîniya li dû kuştina wî îfade dîke: “*Ez ê çibkim lolo loloooo... eşîra Torê binya mêrdîne hêlayê bê ser û xudaoooo loyy...*” Mirina lehengê mêr bi eşîrê re yek tê dîtîni û tradîsyona ku li ser piştê mêr bi rê ve diçe di vir de tê xuyan herwiha tê dubare kirin. Di dewama kilamê de daxwaza heyf hilanînê dixuyê:

“Rabû rextê milê va xorta kim

Heke mi heyfa Silêmanê Emer bilin kir...”

Yek ji hêmanên ku di kilamên şer û şîne de herî zêde tê emilandin jî peyva “derb” e ku kuştin ango birîndarbûna leheng îfade dîke û bi formên curbicur tê emilandin. Di vê kilamê de qaliba “derb” li gel qaliba “xwîn û birînê” wiha hatiye emilandin:

“Çawa derbeka lê dane

Silêmanê Emer lolo lo loo xûna wî nasekinê

Heta dankî sibê lolo loo birîna xwîn tê der...”

Di dewama kilamê de ji hêmanên kilamê şînê “hekîm, melhem, derman” dixuyên. Vebêjer ji hekîm daxwaza dermankirina birîna Silêmanê Emer dike û li hember vê jî tiştên ku bide hekîm rêz dike. Ev beş wiha ye:

“Silêmanê Emer birînê wî derman bike lolo lolo looo  
hekîmoo bextê te me bê hîle ooo...

Ez ê bidim tevî garan û pezê lolo gundê me ooo...

Heke tu bê Silêmanê Emer derman bikî bê hîle waa..

Ez ê bidim te vî her sê zeriye loloo qesrêê... oooo...”

Kilamekî din ya ku em ê di vê xêbatê de li ser rawestin kilama “Bavê Koroxlî (Mûşa Şewitî)” ye ku ji aliyê “Meryem Xan” ve hatiye gotin û me jî ji dengê wê derbasê nivîsê kiriye. Kilam wiha ye:

**“Mûşa Şewitî /Bavê Koroxlî”<sup>6</sup>**

Le hêêêê... wezê diyarî Mûşa şewitî ketim navî  
daraaa...

Lê wezê diyarî Mûşa şewitî ketim navî daraaa...

De bejna Bavê Koroxlî ji şal u şapikan û kîtananaa..

Te têlqrafekî resmî ji Bavê Koroxlî re hatî girêdanaaa...

Perîşanêê bi sê denga li Perîxanê dikir gazîî...

digo xwezî pora serê min û te kurr bîî...

Derbekaa lê dane li bavê Koroxlî ay bi sê gula ji canî  
birîndar eee...

ay de bavo wey bavoo, wey bavo wey bavoo...

De axaooo tu axa yîî... tu gula mala Emerîî ay tu berxê  
mala Xêlidîî...

Ay tu me’b destê dewleta Alî Osmanîî wey bavoo wey  
bavoo...

De hêêêê... wezê li diyarî Mûşa Şewitî ketim navî  
genimeee..

De wezê li diyarî Mûşa Şewitî ketim navî genimeee..

De dibêê têlqrafekî ji bavê Koroxlî re resmî hatî wezê  
nizanim kî neee...

<sup>6</sup> <https://www.youtube.com/watch?v=7ksDKgRi9iA>

Perîşanê bi sê denga li Perîxanê dikir gazî digo xweska  
pora serê min û te kurr bêê...

De wekî roja li bavê Koroxlî diqewimî

Ay dê sê çar suwarê motka mîna zindanê Cengizxan  
disekinî

ax de wey bavo wey bavooo...

Di navenda kilamê de kuştina lehengê bi navê “Bavê Koroxlî” heye. Di kilamê de bajarê “Mûş”ê jî wek mekân gelek caran tê dubare kirin.

Di gotinên destpêka kilamê de her çend “Mûşa Şewitî” nîşaneyê neyîniyekê be jî di derheq mijara kilamê de bi tena serê xwe zêde agahî nade me. Lê pişt re dîsa di gotinên destpêka kilamê de em dibînin ku forma “bejn û bal”ê derbas dibe ku me berê jî gotibû ev form ango teswîr bi guhdaran dide zanîn ku leheng pergî neyîniyekê hatiye ku dibe birîndarî an jî kuştin be. Ev form di kilamê de wiha hatiye emilandin: “*De bejna Bavê Koroxlî ji şal u şapikan û kîtananaa...*”

Gotina li dû vî jî forma “têlqraf”ê ye ku bi gazî û xeberê re girêdayî ye ku em dikarin wek hatina xebera reş jî şîrove bikin. Ev yek wiha hatiye emilandin: “*Te têlqrafekî resmî ji Bavê Koroxlî re hatî girêdanaa...*” Gotina li dû vî tesbîta me piştrast dike ku “têlqraf”a nexêrê ye û wiha dibêje:

“Perîşanê bi sê denga li Perîxanê dikir gazîî...

digo xwezî pora serê min û te kurr bîî...”

Herwiha em dibînin ku di vê gotinê de rasterast ji hêmanên kilamê şînê “gazî” û forma porê ya ku wek “pora serê min û te kurr bî” hatiye emilandin. Herçend hêj ku di derheq birîndarbûna leheng de tiştekî zelal nehatibe gotin jî ev hêman di derheqê atmosfer û dewama kilamê de fikir didin me. Tekîn Çifçi li ser porkurkirina jinan ya di dema şîn ango hawarê de wiha dibêje:

Kengî êşeke mezin çêbûye, yekî gelekî hêja hatiye kuştin an jî tev kujiyek çêbûye, jinan porê xwe jêkiriye. Porkurkirin, destnîşankirina şewata nava dilê jinan e. Îro jî di şînan de em dibînin ku jin an porê xwe dirûçikînin, an jî rûyê xwe bi neynûkên xwe reş dikan; xwe din ava xwîne de dihêlin. (...) Di nava vê şînê de jinên şînbêj kilamên nû diafirînin. Dengbêj jî ji van çavkaniyan avê vedixwin (Çifçi, 2013, r. 25).

Li dû formên “gazî” û “porkurî”yê dengbêj bi awayekî ku tenasub çêbike behsa kuştina Bavê Koroxlî dike:

“Derbekaa lê dane li Bavê Koroxlî ay bi sê gula ji canî  
birîndar eee...”

ay de bavo wey bavoo, wey bavo wey bavoo...”

Ev gotin sê hêmanên bingehîn yê kilamên şînê di hundirîne ku ev “derb, gule û birîndarî” ne. Li gel vê dubareya gotina “wey bavo” jî em dikarin wek medet û teselî xwestina ji bavê şîrove bikin û wek forma “yadê rebenê” di nav hêmanên şînê de binirxînin.

Kilamekî din ya ku me ji bo vê xebatê hatiye bijart kilama “Hesenê Mala Mûsa” ye ku ji aliyê hinek dengbêjan ve jî wek “Ehmedê Mala Mûsa” jî hatiye gotin. Vê kilama ku ji hêla mijarê ve li ser evîndariyê hatiye gotin me ji dengê dengbêj “Mehme Gulî” deşifre kir. Kilam wiha ye:

**“Hesenê Mala Mûsa”<sup>7</sup>**

Eywax limiîn... Heywax limiîn... Lê malaa min êêê...

Yadê rebenn... Hesenê mala Mûsa mi dixwaze mi biidînê...

Yadê rebenn... sola lê qetiya ji hatinê ji çundînê...

Yadê rebenê kulavkê mala bavê mi qetiyaa ji raxistinêêê...

Yadê rebenê migo taweka mala bavê mi qul bûye ji hêka qelaaandinêêê..

Yadê rebenê Hesenê Mala Mûsa

delalîkê dilê mi beranê sorînkirî mi dixwaze lo mi bidînêêê...

Yadê rebenê mi go qelendê xwe bixwazin wek adetê lo’b serodinê

Yadê rebenê mi go heye hûn ê mi nedinê

min ê soz daye ez ê bikim kar û barê xwe yê lo revandinêêê...

Heywax li miîn heywax limin lê.... Lê malaa min êêê....

Yadê rebenê mi go Hesenê Mala Mûsa beranê sorînkirî nine mêre di kuştinêêê...

Yadê rebenê ji bona xudê hûn ê bidin hetka? Qaso lo kevnaajinêê.. oyyy..

Yadê rebenê heyfa mi nayê li kuştina mêran

<sup>7</sup> <https://www.youtube.com/watch?v=XbXzs9LB-1s>

heyfa mi tê li çavê reş û belek simbêlê sorî sosinî  
çavê reş û belek weyla li mi korê ax ketinê  
eywax li min eywax li min lê mala min êêê..  
yadê rebenn hetka Qasoo digo Hesenê Mala Mûsa  
mi go ev paayîz eee... wext maaziya..  
yadê rebenê xelkê rahiştin tur û rotê xwe ye  
xwe berdane çiyakê mazî lo çûn maaziya..  
yadê rebenê weyla li mi korê ez û Hesenê Mala Mûsa  
beranê sorînkirî  
me yê rahişt tûr û rotê xwe ye me xwe berda çiyayê mazî  
em ê çûne benda mala Qaso lo çûn mazîya  
yadê rebenê mi go ez û Hesenê Mala Mûsa  
em ê ji xwe re ketin kêf û di hineka ditin u laqirdiya..  
erê gava Hesenê Mala Mûsa beranê sorînkirî  
gava destê xwe avêt hemû mor û mircanê mi lo  
qeetiyaa..  
yadê rebenê mi go min û Hesenê Mala Mûsa  
ji xwe re hûrik hûrik hebo hebo lo neqandiyaaa..  
Yadê rebenê ez û Hesenê Mala Mûsa tiqo tiqo pev  
keenyann..  
Erê weyla li mi korê mi bala xwe dayê tivingkî ji xama  
xama lo diteqiyaa.  
Yadê rebenê weyla li mi korê mi bala xwe dayê Hesenê  
Mala Mûsa beranê sorînkirî  
Erê li nav gola xwînê bi ser zend û benê kalî bozê lo  
wergeerîya  
Yadê rebenê mi go rih şîrîn bû min û Hesenê Mala Mûsa  
me yê'b destê hevdu girt û lo em reeviyann..  
Yadê rebenê weyla li mi korê



mi bala xwe dayêê simkê qaso mi goo xurmîna hûtê nav  
devîyaa..

De çawa li pêşiyam min û Hesenê Mala Mûsa beranê  
sorînkirî lo wergeeriya...

Awî heywax li min heywax li min lê mala min êêê...

Yadê rebenê hûn ê Hesenê Mala Mûsa nekujin bidin  
hetka qasoo lo kevnaajînê...

Yadê rebenê heyfa mi nayê li kuştina mêran

heyfa mi tê mi go li simbêlê sorî sosinî

çavê reş û belek weyla li mi korê lo ax keetinê...

heywax limin heywax li min lê mala min êêê...

Erê heywax limin heywax li min lê mala min êêê...

Yadê reben hetkê Qaso dîgo Hesenê Mala Mûsa

heyraa mi go bila li me nehataa îdaa loo vê qurbanêê...

Yadê reben min ê bala xwe dayêê

qîz û bûkê gundê me xwe xemilandine xwe berdane ber  
govendê ber dîîlanê

Yadê reben min ê bala xwe dayêê

mi go xortê gundê me re çek û sîlehê xwe berda, xwe  
berdabû lo ber nîşanê

Yadê weyla li mi korê keza kor poşman be li rîya malikê  
malê

Min ê bala xwe dayê çek û Hesenê Mala Mûsa

beranê sorînkirî mayî li alîkî lo di eyywanêê...

Ax heywax li min heywax li min lê malaa min ê...

Yadê rebenê mi go hûnê Hesenê Mala Mûsa nekujin

bidin xatirê hetka qasoo lo kevnaajînê...

Yadê rebenê weyla li mi korê heyfa mi nayê li kuştina  
mêran

heyfa mi tê mi go simbêlê sorî sosinî çavê reş û belek

weyla li mi korê loma ax keetinêê...

Ev kilama dirêj ku ji aliyê gelek dengbêjan ve hatiye gotin û di nav kilamên evîniyê de xwediyê navdariyê ye ji aliyê vebêjerekê jin ve tê gotin ku ev vebêjer herwiha lehengê kilamê ye ku dixwaze bi “Hesenê Mala Mûsa” re bizewice. Lê belê ev daxwaz rastê gelek astengiyan dibe û di dawiyê de jî bi kuştinê bi encam dibe. Kilam her çend li ser evînek bêmiraz be jî em dibînin ku mijara kuştin û lehengiyê jî dertê pêş. Herwiha hatiye dîtin ku bi kilamên din yên şînê re xwedî gelek hevpariyên e, ji ber vê yekê ev kilam jî di xebata me de cih girt.

Di kilamê de ji aliyê vebêjer ve gelek caran forma “mi go” tê emilandin û li gel îfadekirina daxwazê herçend kilamê nêzê diyalogê bike jî li hember vê em axaftin ango bersivê nabînin. Bi vê awayê vebêjerê jin serpêhatiya xwe û “Hesenê Mala Mûsa” vedibêje.

Kilam bi vê forma heyfanîn, êş û xemgîniyê dest pê dike: “*Eywax limiin... Heywax limiin... Lê malaaa min êêê...*” Di vê gotinê de ji bilî “eywax” û “heywax”ê gotina “mala min” dertê pêş ku di kilamên pêşî de jî bi formên cuda hatibû emilandin. Bikaranîna van her sê forman ligel hev hê di destpêkê de di derheqê kilamê de hin agahiyan dide me.

Li dû van formên destpêkê di bêhna duyem de vebêjer mijar û qewimînên kilamê yên muxtemel aşkera dike, bêhna duyem wiha ye: “*Yadê rebenn... Hesenê mala Mûsa mi dixwaze mi biiidinêê...*” Ev gotina kilamê diyar dike ku şîn ango xemgîniya vebêjer li ser evîn û mirazê ye. Di vir de forma “yadê reben” jî wek hêmanekî hevpar ya kilamên şînê dertê pêşiya me.

Vebêjer gelek caran pesnê “Hesenê Mala Mûsa” dide û heyfa xwe pê tîne. Yek ji van forman wiha ye di kilamê de:

“Yadê rebenê heyfa mi nayê li kuştina mêran

heyfa mi tê li çavê reş û belek

simbêlê sorî sosinî çavê reş û belek weyla li mi korê ax  
ketinêê...”

Di vir de vebêjer bi qasê ku pesnê “çavê reş û belek” yê “Hesenê Mala Mûsa” dide ew qas jî li hember kuştina wî “korbûna çavên xwe” dixwaze. Ev daxwaza metaforîk ya ku li dor “korbûna çav”ê hatiye honandin hêmanekî hevpar ya kilamên şînê ye. Di vir de formekî din ya ku bala me dikişîne forma “heyfa mi nayê li kuştina mêran” e ku di kilamên dengbêjan de bi taybet jî di kilamên şerê de derbas dibe. Di xebata xwe ya hevpar de Wendelmoet Hamelink û Hanifi Barış di derheqê vê formê de wiha dibêjin:

“Vegotina “heyfa min bi vê yekê nayê, bi vê yekê tê” di van cureyên kilaman de zehf derbas dibe. Mirina şervanekî di şerekî gernasiyê de normal tê qebûlkirin, ku bi awayekî din ev zehf xembar e lê di şerekî wiha de

mirov dikare qebûl bike. Lê, çend şert û encamên ku di kuştina leheng de derdikeve diwartir e û mirov nikare qebûl bike” (Hamelink&Barış, 2004, r. 189).

Bi îlhama vê jêgirtinê, em dikarin bibêjin ku di vê kilamê de jî vebêjerê jin kuştina evîndarê xwe “Hesenê Mala Mûsa” bi pesindayîna wesfên wî estetîze dike û di nav peywenda gernasî û lehengiyê de bi cih dike. Herwiha, vebêjer kuştina leheng ya bi xedarî ji aliyê “Simkê Qaso” ve û “ax ketin” a çavê evîndarê xwe qebûl nake.

Xeynê van teswîra demsala payîzê di vê kilamê de jî dertê pêşiya me û em ji naverokê fêhm dikin ku ev bûyerên xemnak jî di demsala payîzê de diqewimin. Ev gotinên di derheqê payîzê de wiha ne:

“Hesenê Mala Mûsa mi go ev paayîz eee... wext maaziya...

yadê rebenê xelkê rahiştin tûr û rotê xwe ye xwe berdane çiyakê mazî lo çûn maaziya...”

Yek ji hêmanê kilamên şînê ku di vê kilamê de jî derbas dibe xwîn e ku bi vê şiklê derbas dibe:

“Yadê rebenê weyla li mi korê mi bala xwe dayêê Hesenê Mala Mûsa beranê sorînkirî

Erê li nav gola xwînê...”

Vebêjer ber bi dawiya kilamê ve -ango piştî kuştina “Hesenê Mala Mûsa”- bi rêya du rewşên dijber honandina xwe bêhtir xemdar dike û li aliyekî honandinê şîna xwe li aliyê din jî şahiya qîz û xortên gundê xwe datîne. Ev rêbaza dramatîzekirinê di kilamên şer ango şînê de bi şêwe û qalibên cuda tê dîtin. Ev beş wiha ye:

“Yadê reben min ê bala xwe dayêê

qîz û bûkê gundê me xwe xemilandine xwe berdane ber govendê ber dîîlanê

Yadê reben min ê bala xwe dayêê

Mi go xortê gundê me re çek û sîlehê xwe berda, xwe berdabû lo ber nîşanê

(...)Min ê bala xwe dayê çek û Hesenê Mala Mûsa

beranê sorînkirî mayî li alîkî lo di eyywanêê...”

## Encam

Dengbêjî weke hunereke resen ya çanda Kurdan, ji aliyê vegotina bûyerên civakî ve xwedîyê girîngiyê ye. Dengbêj bi gelemperî li ser bûyerên ku civakê di bin bandora xwe de hiştine radiwestin. Di vê xebatê de li ser kilamên dengbêjan yên ku li ser şer û kuştinê ne hate rawestan. Kilamên ku li ser şer, kuştin û qewimînên xembar in me wek kilamên şînê bi nav kir. Me di vê xebatê de cih da cureya zêmarê jî, lewra ew jî wek kilamên dengbêjan yên şînê bi taybet li ser qewimînên xembar tên gotin. Li ser vê bingehe me di navbera zimanê zêmar û kilamên şînê yên dengbêjan de taybetiyên hevpar jî tesbît kir.

Di çarçoveya vê xebatê de 6 kilamên dengbêjiyê (Şahîno, Qasimo, Silêmanê Emer, Bavê Koroxlî, Hesenê Mala Mûsa û kilamek Huseyno ku li ser kuştina leşkerekî Gimgimê hatiye gotin.) hatin deşîfre kirin. Ev kilam ji aliyê naverok, teswîr, qalibên gotinê, herikîn û lihevanîna bûyeran ve hatin analîz kirin. Di encama analîza van kilaman de derket holê ku di kilamên dengbêjan de hêmanên şîn û xemgîniyê yên hevpar hene. Li gel vê yekê hat dîtîn ku dengbêj di honaka kilamên şînê de zimanekî estetîzekirî bi kar tînin. Lehengên kilamên şer û kuştinê ji aliyê dengbêj ve tînin îdealîze kirin. Vegotin bi gelemperî dualî diherike, li aliyek lehengê sereke (baş, qehreman) û li aliyê din ve jî lehengên xirab (xayîn, kujer) dertên pêş.

Hevpariyên kilamên şînê ku me di vê xebatê de tesbît kirine em dikarin wiha rêz bikin:

1. Di destpêka kilaman de piştî formên wek “heywax, eywax, lê lê, lo lo” bikar anîna navê lehengê.
2. Bikaranîna forma “mal”ê ku wek “malxirabo, mala min xirabe, malşewitî, mala te bişewite, agir bikeve mala...,” tê dîtîn.
3. Di kilaman de formên ku bi dê/dayik re wek “dayê/yadê rebenê, dilê dayka te..., te dilê dayka xwe şewitand,” hatine emilandin.
4. Nifirkirina li neyar, fesad, nexêrxwaz û hwd. bi formên curbicur. Wek: “xêrê ayê nebînî, agirê kulê bikeve mala, mala.... bişewite, nezewicî, xêrê nebînî, şa nebî”
5. Bikaranîna forma “gule”yê ku kuştin ango birîndarbûna leheng îfade dike. Wek: “gulekî berî bedena, gulekî lê dane, bi.....guleyan.” Bi peyva “gule”yê re emilandina peyva “meydan”ê ku lehengê kilamê li meydanê tê kuştin û ev yek lehengî û wêrekiyê temsîl dike. Wek; “li orta meydanê, li nava meydanê.”
6. Qaliba “bejn û bal”ê ku ji bo teswîra leheng ya di dema kuştin yan jî birîndarbûnê de gelek ceran tê emilandin. “bejn û bala.....delalî.”
7. Bikaranîna peyva “birîndar” û formên girêdayê wê. Wek; “birîndarê mala bavê mi, birîna kûr, birîne birîndarê..., birîna xedar...”

8. Emilandina peyva “derb” ku kuştin û birîndarbûnê îfade dike. Wek; derbekî, derbeka/ê, bi sê derba...”
9. Forma “xeber”ê ku wek destpêka bûyeran ango aksiyonê ye. Exleb wek “xebera reş, xeberkî hatî, xeberkî girtî” herwiha di heman wateyê de emilandina “bang, gazî, hawar, bavo”. Emilandina “por”ê ku her tim girêdayê jinan e û li hember êşê di formên wek; “porkurê, pora te kur bî, pora xwe biqusînim, pora xwe bikim hefsar, biskbirîn, pora serê xwe bikim bawêşîn û hwd.” tê dîtin.
10. Di qada teswîrên demsalan de bikaranîna “payîz û zivistan”ê. Li gel vê peyva “sarbûn”ê jî tê emilandin. Wek; “çemê sar, axa sar...” Formên payîz û zivistanê wiha ne; “payîz hatî..., payîz e sar e, payîza vê welatê, Şevêk şevê payîza...”
11. Di kilaman de emilandina formên bi çavê re têkildar ku wek; çavê mi kor bî, çav korê, weyla li mi korê, çavê dêka/dayka te kor bî, korayî bi çavê....hatî û hwd.” tèn xuyan.
12. Di kilaman de emilandina peyvên ku perîşanî, bêçareyî û xemgîniyê diyar dike wek; “dêranîm, nemînim, nemayê” jî wek hêmanên hevpar hatine dîtin.
13. Di kilaman de ji birîndar re dirustkirina “cî, belgî, berpâl û doşekê” ku di van forman de tê emilandin; “wezê bibim cî û belgî û berpâl, wezê raxim doşek û...”. Ev têgeh jî wek hêmanên hevpar hatine tesbît kirin. Girêdayê van ev form jî tèn emilandin; “nexweşê bê hal, nexweşê nav nivînê...” Herwiha ev peyv û formên girêdayê van jî di kilaman de zehf tèn emilandin; “dimirim, kul, derd, keser”.
14. Di kilaman de daxwaza heyfhilanînê wek; heyfa.... mi hilîne/hilînin, kes tune heyfa... hilîne, heyfa xwîna... hilîne û hwd.” tê dîtin.
15. Ev formên ku kuştinê wek mêranî û gernasîyê teswîr dikin jî di kilamên şer û şînê de gelek caran hatiye emilandin; “heyfa mi nayê li kuştina mêran..., heyfa min nayê li wê heyfê..., heyfa min tê li wê heyfê...”

### Çavkanî

- Aktulum, K. (2013) *Folklor ve Metinlerarasılık*, Konya: Çizgi
- Allison, C. (2007) *Yezidi Sözlü Kültürü*, İstanbul: Avesta
- Alkar, Alkar, R. (2011), “Dengbêjlik Geleneği ve Toplumsal Cinsiyet: Midyat Örneği”, *Mardin Artuklu Üniversitesi, I. Uluslar Arası Keşf-i Kadim Sempozyumu: Matiate'tan Midyat'a Sempozyumu*, Mardin, 401-415
- Çiççi, T. (2013) “Di Kilamên Dengbêjan de Porbirrîn /Gulibirrîn”, *Nûbihar*, Hejmar: 125 25-27
- Çiççi, T. (2014) *Kilam û Jin*, İstanbul: Nûbihar
- Farqini, Z. (2011) *Ferheng Kurdî-Tirkî*, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol.

- Gürür, Z. (2014), *Dengbêjî Di Peywenda Patronajê De*, (Teza Lîsansa Bilind ya Neçapbûyî) Mardin Artuklu Üniversitesi, Yaşayan Diller Enstitüsü, Mardin.
- Hamelink, W. Barış, H. (2014) “Dengbêj Di Sînoran De: Sînor û Dewlet Bi Nêrina Kilam-Bêjên Kurd”, *Wêje û Rexne*, Hejmar: 3, 173-200
- Kardaş, C. (2017) *Âşîgîn Sazî Dengbêjin Sesi*, Ankara: Eğiten Kitap
- Kaya, D. (2014) *Anonim Halk Şiiri*, Ankara: Akçağ
- Kızıldemir, Z. (2002) *Kürt Halk Şarkılarının Sosyal İşlevi, Kürt Müziği, Dansları ve Şarkıları*, (Haz: Mehmet Bayrak), Ankara: Özge 385-409
- Sanders, B. (2016), *Öküzün A'sı*. (çev: Şehnaz Tahir), İstanbul: Ayrıntı
- Taş, F. (2015) *Dengbêjlik Geleneği ve Dönüşümler*, (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi) Ankara Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Ankara
- Ong, W. J. (2014) *Sözlü ve Yazılı Kültür*, İstanbul: Metis
- Özagaçhanlı, Z. (2012) “Kürtlerde Sözlü Kültür ve Hikâye Anlatıcılığı: Dengbejlik Geleneği”, *Kimlik, Kültür ve Değişim Sürecinde Osmanlı'dan Günümüze Kürtler Uluslararası Sempozyumu*, Bingöl, 788-807